Wergerandin

Civaka Sivîl

Ferîq 'Ebdilrehman
W:Besam Mistefa

Diyarbûna Civaka Sivîl hate girêdan bi dîroka xebata milletan û hewildana wan bo peydakirina demokrasî û wekhevî û azadiyê weke çareseriya herî baş ji dijberiya derveyî di navbera haceta mirov bi azadiyê ji aliyekî ve û asayiş û sîstema ku dewleta ku dikare têkiliyên civakî rêkbixe, wan jê re peyde dike de.Wisa, deselata ku di forma dewletê de cî digire bi hewildana xwe ji bo cengan û tevlîheviyê bi hinceta parastina mafên mirovan bû sedemê rabûna hindek şoreşên millî ku daxwaziya demokrasî û rêzgirtina mafên mirovan dikin.Di vir de, pêwîstiya damezrandina kom û komelan ji bo berevanîkirina wan mafên navbirî li hember zordaran û çêkirina balansekê di navbera azadî û rêjîmê de, hate holê.Ev komikên ku bûne laşên serbixwe negirêdayî bi dewletê, ji xwe ne ji serxwebûna wan bûna wan ne dikarî serdestiya dewletê kêm bikirana.Herweha, ev laş(kiyan)xwebexşan bûn ji bo takekesan bê guhdana cudahiyên di nav wan de heyî mîna ol, regez, reng û mezheb ji ber ku Civaka Sivîl warekî serbixwe ye ji hemwelatiyan re ku tê de azad in di rêxistina jiyana xwe de û ew gelek rêxistinên serbixwe dihewîne vekirî bo hemwelatiyan da ku tevlî wan bibin bi armanca xizmetkirina berjewendiyekê yan dozekê yan armancekê bi riyên aştiyane û rêdana komik û komelên din ku ew jî karê xwe bikin.Tevlîbûna azad ya van rêxistinan tê wateya ku jiyana civakî guhertiye ji kêşeyeke qederê ku takekes jê re radest dibe û nikare biguherîne berbi biryar û bijartinekê ve û eveye mafê mirov di destnîşankirina çarenûsa xwe de ye.Wihareng e ku, Civaka Sivîl di navbera komên ku berjewendiyên taybet yên endamên xwe derdibirrin û dewleta ku berjewendiya gişt î ya civakê derdibirre de, xalgihînokek e.

Gelo ev tê wateya ku Civaka Sivîl û dewlet di pevçûn û dijberiyeka berdewam de ne?

Civaka sivîl tenê dijberî dewleta sitemkar û ne demokratîk e, ji ber ku dewlet ne herdem di hewildanê de ye ku azadiyan kêm bike û wan qedexe bike.Rasttir ji vê, dewlet mîna alavekê ye ku mirovan ew peyda kiriye bi armanca parastina kiyanê civakê û bicihanîna sîstemê.Dewlet rola xwe ya erênî heye di warê hewildana pêkanîna geşepêdana aborî û parastina nasnameya rewşenbîrî û şaristanî ya civakê.Ev armancên ku her gelek wan dixwaze.Di vî warî de, giring e ku diyalog di navbera tiwêjên rengereng û dewletê de bihên kirin û nêrîn werine guftûgokirin. Lê ev diyalog wê çawa pêkwere?Di baweriya min de di riya rêxistinên Civaka Sivîl ku bûne pir di navbera gel yaxud civakê û dewletê de.Pirseka din ya giring ew e pêwendiya Civaka Sivîl û demokrasiyê-:Demokrasiya her komelgehekê dimîne li ser hebûna civakeka sivîl a serbixwe ku hemwelatiyên wê azad in û dikarin

jiyana xwe birêbixin dûr ji serdestiya dewleta zordar û ev pîvana herî rast e ji rastiya demokrasiyê re ji ber ku hebûna wê civakê dihêle ku hikûmet xwestekên takekes û komikan yên ku pêdiviyên wan û arezûya wan di jiyaneka baştir de derdibirrin, bersiv bide .An ku çiqasî ku sazî û dezgehên Civaka Sivîl hebin û rola xwe bicih bînin, ew qasî demokrasî bihêztir û çalaktir dibe.

Gelo rola Civaka Sivîl li dijî ya hikûmetêye?

Bê dudilî em dikarin bibêjin ku rola Civaka Sivîl ne li dijî rola hikûmetê ye, ji ber vê çendê ku rola Civaka Sivîl wekû rola hikûmetê ji bû rêxistina pêwendiyên siyasî û civakî tê bikar anîn, angu armanc yek e û ewjî pêkanîna berztirîn pileya balansê di navbera maf û erkan de hinde ku kiyanê civakê yê giştî bête parastin.Cîhan û pêşveçûnên ku çê dibin pêwîst dikin em di navbera dewletên pîşesaz yên pêşketî û dewletên paşketî de cudahiyê bikin.Nabe ku em tiştê di girûpa yekem de pêktên li ser girûpa didiwan ferz bikin, bi kurtî ji ber ku tiştê pêwendiya dewletê bi sektor û saziyên Civaka Sivîl ve girêdide di dewletên pêşketî de xwe dispêre demeke dirêj di pêvajoyên ku ew dewlet tê de derbas bûne ji pêşveçûna pîşesazî û aborî û çesipandina demokrasiyê li gel partî û heyetên wan dewletan.Berevajî vê çendê, ev di dewletên paşketî de peyde nabe hinde ku ew hê di qonaxa pêşveçûnê de ne û wek ku tê zanîn ev pêşveçûn û guherînên civakî û aborî roleke berz ya ku nayê inkarkirin û guhnedanê, ferz dikin.Konsepta birêvebirina karûbarên dewlet û civakê hate holê mîna derbirrînekê ji têkiliya aloz ya di navbera alavên dewlet û hukmraniyê ji aliyekî de û damûdezgehên Civaka Sivîl de ji layê dîtir ve, heyî. Di warê analîzekirina siyasî û civakî de du encam li vir bidest dikevin:-

Yekemîn:Konsepta birêvebirina karûbarên dewlet û civakê hewil dide ku birêvebirina dewlet û birêvebirina civakê di yek têkistî de ku li ser nimûneyên refilaksiyon û paradoksên di navbera elementên aktîv di dewlet û civakê de,girê bide.

Diwemîn:Konsepta birêvebirina dewlet û civakê wêneyekî realit e û pratîk derbarê jiyana siyasî û civakî ya ku dualiyan û sînorên cudaker yên ku lêkolîner wan lê zêde dikin nabîne, dide.Realeta jiyana siyasî û civakî têkelbûneke germ di navbera van elementan de bi xwe digire ev tiştê ku di encamên lêkolînên tecrîbî de di van 30 salê dawîn de hate çesipandin . Herweha, çiqasî ku rol û berpirsyariya Civaka Sivîl û kerta taybet zêde bibe, ew qasî pêwendî bi dewlet û dezgehên hukmraniyê re bipêş dikeve. Civaka Sivîl ne laşekî tenê ye lêbelê ew ji komikên ku bi pirrengî û pirbûnê xemilandî ne tête hev, ku hewil dide razîbûn û yekbûnê di navbera wan de pêkbîne evên ku eger qels bin Civaka Sivîl mecbûr dibe ku xwe bispêre hikûmetê û arîkarî û piştgiriyê jê bixwaze,û ji encama vê yekê maytêkirina hikûmî diqewime lê bi sînorên xuyayî ji vê maytêkirina deselatdarî di civakê de ku dewlet rêzê lê digire û xwe pêgirêdide. Hebûna Civaka Sivîl pêwîst dike ku dewlet yeka bihêz be ku bikaribe bingehên yasayî ferz bike û mafan biparêze an ku mafên hemwelatîbûnê û rêzgirtina azadiyên takekesane yên ku di destûr de heyî.Bê hebûna vê rola dewletê, civak dê biguhere bo kiyanekî pûç û vala û bê wate, û belkû bibe biveyek derheqê azadiyan de ne kêmtir ji biveya hikûmeta zorbaz di neamadebûna demokrasiyê de.Hêza Civaka Sivîl nikare dev ji hêza dewleta qewîn ya ku deselateke demokratîk wê birêve dibe, berde.Hêz li vir nayê

wateya zordariyê lê tê wateya karîbûna bicihanîna xwestek û daxwazên welatiyan .Ji layekî dîtir ve, hêza Civaka Sivîl jî nayê wateya derketina wê ji sîstem û yasayê lê hêza gotî girêdayî ye bi rêzgirtina bingehên lîstika siyasiya heyî ve .Opozisyona hikûmetê û rexenekirina biryar û konevaniyên wê ji bingehên fonoqisyona çavnêrîkirina Civaka Sivîl ji hikûmetê re ne, lê bi şertê ku negihe radeya ku komên Civaka Sivîl biryarên hikûmetê têk bibin.Civaka Sivîl hewil dide çaksaziyê peyde bike û şaşîtiyan rast bike û daxwazkirina rastkirina konevaniyan di riya haydarkirina bi kêmasî û bikaranînan yên ku mafên takekesan binpê dikin bi kifşkirina çewtiyan û şermezarkirina hikûmetê derbarê wan.Mesele ne di hebûna rêxistin û dezgeh û heyetan ji layê hukmiraniyê de ye eger ku ew cewherê Civaka Sivîl ji aliyê çawaniyê de an ku ji aliyê tevger û livên takekesan û radeya danûsitandina wan bi hevûdu re bi qîmet û perensîpên tolerans û diyalog û pijirandina pirrengiyê û rêzgirtina mafên muxalîfan û nepijirandina tundûtûjiyê dernebirin, an ku ew qîmetên navhatî ne tenê silogan bin ji layê wan koman ve lêbelê perensîpên serdest bin û pîvana karpêk û livên wan bin.Parastina Civaka Sivîl ji maf û berjewendiyên kom û takekesan re ne li dijî, wê yekê ye ku ew alaveke rêxistin û parastina seqamgîrî û yekîtiyê di civakê bi giştî de ye, her weha berevanîkirina berjewendiyên taybet bi hindek tiwêjeyan nabe asteng ku ew guh bide dozên berjewendiya giştî ya komê yaxud dabînkirina arîkariyê ji tiwêjên kiz û belengaz re û dibe alîkar ji bo dewletê di warê bicihanîna plan û bernameyên geşepêdanê , ev fonoqisiyon bi yên dewletê re arîkar in an ku dabeşkirina stûbariyên civakî, û aborî di navbera desthelat û civakê de ye ku her yek rola ya din bihêztir dike ji bo bicihanîna armanca hevbeş angu parastina gewdeyê civakê û bipêşxistina wê. Di vî biyavî de,tevgera nûjenkirina Rojavayî li ser du stûnan radiweste-: 1-çesipandina mafên hevwelatîbûnê. 2-çesipandina azadiyên sivî Bi gotineke din,ew xwe dispêre felsefeya Lîberalîzimê anjî felsefeya azadiyên takekesî, û serdestiya komê bi navê olê yan berjewendiya netewê napijirîne .An ku cewhera wê çesipandina mafên takekes û dabînkirina wan bo mafên hevwelatîbûnê dê mafên hemiyan û komê jî dabîn bike.Çi hizra olî yan neteweyî ku mafên takekes û hevwelatîbûnê bipaş dixe bi behaneya berjewendiya giştî di bin navê ol yan netewe yan çîna karker(pirolîltariya)û pîstirîn dîktatoriyet li ser van bingehan hatine damezirandin.

Neteweyên ku xwe dispêrin rêzgirtina mafên takekesan û mafên hevwelatiyan û destûrkirina wan,bipêşketin û geş bûn.

Konsepta destûr bi xwe jî wekû bilindtirîn yasa di civak û dewletê de,dê heykelekî pûç û vala û bê naverok be eger ku ji(mafên hevwelatîbûnê)destpê neke ji ber ku ew bingeha tevahiya saziyên civaka nûjen in, û di riya wan re legaletiya çi tevger yaxud yasa yan pratîkê çi hikûmî yanjî heyetî yanjî takekesane be di civakê de, dixuye. Bê van mafên navhatî,Civaka Sivîl li Iraqê tucarî pêk nayê û ew dê herdem parvekirî bimîne li ser bingehên êlî yan olî yan mezhebî,û Navendî dê bimîne semyaneke herdemî ya dewleta Iraqê.

……

……

***Jêder:rojnameya Teaxî-Biratî hijmara 4832-Sêşembe 15-8-2006.**